

Nîvîskarên Pêşeroje

Sitêra geş

Hîvî Liqman Hesen
(Pula pêncê seretayî)
(Batêl)

Kiçek hebû navê wê Ronak bû. Ronakê sitêrek hebû û sitêra wê geleka geş bû her şev sitranek bû sitêra xwe digot. Şevê sitêra wê nediyar bû Ronak gelek bi xem ket şeva dî sitêra wê hat.

Gote sitêra xwe;

-tu bo şeva dî nehatibuy Sitêrî gotê;

-çinku cejna bûna hevala min bû min jî wekî hemu hevalan dîyarîya wê bu bir.

Ronakê got:

-Lê subehî cejna bûna min jîye.

Stêrê gotê;

-Eve bû te ev gula wekî te cwane.

Ronakê jî bersiv da got:

-Sipas sitêra geş û êdî gîru nebe ez jî te xerîb dibim.

Tirî

Hazim Safiya Bileyî
Devera Barzan

Tirî yê reş û zere
Barina wê zora fere
Bixwen xir vîtamîne
Baştirîn fêqiyê xwîne
Gelek curêt wê hene
Her yekî jî tamed hene
Belê ew tiriyê reş
Yê şirîn û yê tam xweş
Dê avê bu kelînin
Tirî dê tê helînin
Hişk diken ber tavê
Yan lê çêtken duşavê
Lê çêtken şerbetê
Vedxwen lê diken lezetê
Belê mezina gotiye
Gotin nexşê beriye
Di bêjin ava li dîv wî
Wekî giriya li dîv mirî



Fêlbazî

(çirokeka folklorîye)

Vehîn izzet (pola şeşê- qutabxaneyê zanko ya seretayî)

Li serma zivistanekê li demê sir û seqe vî li ber rûbarekî gurgêk û ruwîyek û hirçek geheştine êk û hirçê gote gurgî here bu me berxekî bine da vê zivistanê bi xwe bikeyne qelî û li rojên berfê nemînine bîrsî. Gurg çû çû çû heta geheştîye gundekî, dît şivanek yê li ber pezî û xwe li pişt hindek teraşan veşart. Paş berxek kêşa dev xwe raxirand dev hevalên xwe. Demê geheştî berxê xwe dana dev wan û hirçê got:

-Başe niha em dê vî berxikî bu xwe keyne qelî.

Bu zivistanê hemu pêkve kar kir heta kirîne qelî. Kirne di cerkekî da û qepaxa wê dana ser û çûn şikeftêk dîtin, cerkê xwe kire di paşîya şikeftê ra û veşart.

Çend rojek çûn ruwîyê me bîrsî bu, çepêk li xwe da û xwe berze kir çû cerkê xwe jî paş ya şikeftê ina derê û qepaxa wî rakir û hindek qelî xwar.

Demê vegerîya hirçê gotê:

-Ha mam ruwî tu kîve çubuy û te xwe berzekir bu kîve?



-Wîla dahwetek hebu li gundê me hindek mirovên me biçukek bû em çun me sera da û têr xwarin xwar me têr dahwet kir û em hafîn.

Hirçê got:

-Ê dê bêje we navê wî kire çi?

Mam rûwî got:

-Wîla me navê we kire (Serik).

Çend rojekên di çun rûwîyê me xwe berze kir! Çu di şî keftêve cerkê xwe careka di îna derê û qepaxa wê rakir û qelî xwar û pitir ji nîvê jî xwar qepaxa wê dana ser û kire di bin beran û paşî hate û hirçê gotê:

-Ha mam rûwî te kîve xwe berze kir bû

Mam rûwî gotî:

-Wîla em çun hindek mirovên me biçukek bû me jî sera da û têr dahwet kiru û me xwarin xwar jî em hafîn.

Hirçê gotî:

-Xêr bu çi bu we navê wî kire çi?

Mam rûwî got:

-Me navê wî kire (nîvîkî).

Her çend rojekên di seda çun mam rûwî birsî bû û çu, çu di şî keftêve û qelî ya xwe hemu xwar xalî kir û qepaxa wê dana ser û kire di cihê wî da paşî hat û hirçê gotê:

-Ha mam rûwî tu kîve çu buy te xwe berze kir bu kîve?

Mam rûwî gotê ;

-Wîla me dahwetek hebu hindek mirovên me biçukek bû em jî çun me seradaû me têr xwarin xwar û me têr dahwet kir em jî hafîne ve.

Hirçê gotî:

-Ê xêr bû we navê wî kire çi?

Mam rûwî gotê:

Me navê wî kire (Binik).

Wextekî gelek befir kevî û rê û rûbar hatine girtin, hirç û gurg û rûwî birsî bun û qesta şî keftê kirin, û cerkê xwe ji bin bera îna der û qepaxa wî rakir, çi dîtî?

Di binin cerkê hemu xalî û vala xwe binê wê jî hatîye alîstin, her sê man û di nêrtîne êk û dû, hirçê gotê:

-Hey rûwî rûwî, aşkira ke û bêje heke dê vê gavê lepekî te dem û te ji wîrda li erdî dem.

Paşî rûwî gotî:

-Min wenekirîye û haya min jê nîne.

Hirç rabû lepek li rûwî da û ser û çavên rûwî bune xwûn û rûwî kurîya xwe dana ser piştî xwe û revî.

Lewra gotîne ; Mamê rûwî, wekî tûwî çep û çep bo liber çepên xaburê .

Tevenbîrk

Elî Ebdilqadir Mihemed

Tevenbîrk hez dike baran zû bihêt da biçe mala xwe.

Curekê tevenbîrka dibêjnê (bîjna reş). Çinku rengê wê yê reşe û her demekê tevinbîrka nêr tê dev ya mê bu çêkirna têşkan piştî hingî êkser bê giru bûn ya nêr dikuje. Û her gîy-anewerek pêvedet dê kuje. Çinku jehra wî (25) caran hindî hêza jehra marê kobraye. Û jehra marê kobra (25) caran hindî hêza marê Asayîye û tevenbîrk dişet tiştê (900) caran hindê giraniya xwe helbigre û heke qebarê tevenbîrk hindî mirovî ba da şet (60) tena helgire û tevenbîrk dişet (3) salan çi tiştî nexwet. Û tevnê tevenbîrkê ji asnê pulayî bi hêztire. û tevnê tevenbîrkê dibe nêzîkî (30) mêtiran. û hindek curê tevenbîrka hene (8) cav pêvene.

Pê kenîn

Hêja Yehya

* Mamosta pirsyar ji qutabîyekî kir û got:

-(E lî baba) zelame yan jinke?.

Qutabî bi lez bersiv da û got;

-Çi pênev êt zelame.

Mamostayî got:

-Buçî?

Qutabî got:

-Mamosta eger jinik ba da navê wî bibe Elî Mama.

*Kesekî pirsyara dikandarekî kir û got:

-Erê te pêpsiyêt gerim hene.?

Dikandarî got:

-Belê.

Zelamî got;

-Bo xwe bike avtezînkêda daku bi tezin.